بسم الله الرحمن الرحيم

Bi nave Xwedayê rehma Wî pir û berfireh

“Hema birastî Xwedê dixwazê qirêjîyê ji we Ehlê Beytê bibê û we pir û paqij bikê”

“Sûretê Ehzab / Ayeta: 33”

Gelek hedîsên Pêxember (s) hene û ji gelek serçavkên Sunnî û Şî’an hatine gêran ku ev ayeta pîroz derheq pênc kesên “Âlê ‘Eba” da ye û Ehlê Beyt ji hezretê Pêxember û ‘Elî û Fatime û Hesen û Huseyn ra hatiye gotin. Ji nimûne re binêrin serçavkên jêrî:

Musneda Ehmed (h. 241) 1 / 331, 4 / 107, 6 / 292, 304. Sehîha Muslim (h. 261) 7 / 130. Sunen ya Tirmizî (h. 279) 5 / 108, 113 ... Zurriyet-ut Tahire ya Dûlabî (h. 310) 108. Sunen ya Nesa’î (h. 303) 5 / 108, 113. Mustedrek ya Hekîm Nîşabûrî (h. 405) 2 / 416, 3 / 133, 146, 147. Burhan ya Zerkişî (h. 794)

يَفْتَرِقا حَتىّ يردَا عَليَّ الْحَوْضَ.

Resûlê Xweda Kerem Kir:

“Rastî ev e ku ez du tiştên giranbiha di nav we da dihêlim; kitêba Xwedê û binemala xwe, Ehlê Beytê, çiqa ku hûn xwe bi wan bigirin qet hûn li rê winda nabin; û bi rastî ew qet ji hev cida nabin heta ku bal hewzê li min bicivin”

Binêrin:

Ev hedîsa şerîf bi awayên zehfî û mutewatir ji Resûlê Xweda hatiye gêran, yên wek: Sehîha Muslim, c. 7, s. 122; Sunen ya Daremî, c. 2, s. 432; Musneda Ahmed, c. 3, s. 14, 17, 26, 59, c. 4, s. 466, 471, c. 5, s. 182;

HEQÎQETÊ

(Heqîqet Wek Çewa Heyî)

Ce'fer el- Hadî

Wergêr:

Seyyid Elî yê Huseynî yê BOHTÎ

NASNAME

Navê Orjînalê Kitêbê: el- Heqîqet-u Kema Hî

Nivîser: Ce'fer el- Hadî

Wergêr: Seyyid 'Elî yê Huseynî yê Bohtî

Serastker û Edîtor: Seyyid Seccadê Huseynî yê Cûdî

Amadekar: Idare ya Tercume ya Komgeha Cihanî ya Ehlê Beytê

Belavker: Komgeha Cihanî ya Ehlê Beytê

Tîraj: 3000 lib

Çapxane: Mujab

Sal: Sala 2012. p.z. Çapa Ewil.

mekteba wan ew di xwe da girtî û peyrewên wan ew ji winda bûnê parastî, medreseyekî temam e ji bona hemî çiqên zanînên Îslamî. Û evê medresê kariye kesayetîyên mezin bigihênê û terbiye bikê û ewa ‘alimên li ser rêka Ehlê Beyta Pêxember (s.e.a) pêşkêş bikê ji ummeta Îslamî ra ku pirsiyarên tên kirin ji her cihî û ji alîyê her mezhebî ve bigirin û baştirîn cewabê jê ra hazir bikin.

Komgeha cihanî ya Ehlê Beyt (s) ji wê yêkê ra xebtiye ku ji bona wa yên li pey heqîqetê ra gavek nû bavêjê û ji nav nivîsok û kitêbên heyîn hineka pêşkêş bikê ji wan ra; ewan nivîsokan ku nivîserên di mekteba Ehlê Beytê da gihayîn nivîsîne an ewa kesa nivîsî ku Xwedê ni’met li wan kirî û ketîn di vê mekteba berketî de.

Û em teşekkurê dikîn ji nivîserê vê nivîsokê

Komgeha cihanî ya Ehlê Beyt (s)

Arîkarê Ferhengî

“We ce’elnakum şu’ûben we qeba’ilen liyete’arefû” - **“Û me hûn kirin millet û qebîle da hûn hevdû nas bikin”**.

Îslam di halekî da hat ku millet bilave bûn û ji hev hez nedikiran; ne hema ew, belkî li meydanên şerê da hevdû têxistan û ser jê dikiran. Lê belê bi bereketa zanînên Îslamî yên hevgirtin çêker, gelek lez hev nasîn ket şûna ji hev revînê û arîkarî ket şûna dijminîyê; û hevgirtinê şûna pişt danê girt; vêca desthata wê bû ev ku ew ummeta hevgirtî ya mezin, ewa ku xweyê ferhengek berketî ye peyda bû û derket holê; ew ummeta ku gelên wê ji hemî zorgo û zaliman têr bûyîn û bûyîn ew ummeta bi qedr û qîmet di nav gelên cihanê da û bûn ew koma bi heybet li ber çavên zêdegav û zorgoyan da. Û digel wê ji hev cida bûnê û wê ixtilafa fikrî û zehf bûna ferhengên ne wek hev

xwe goherand bi herrete; û kom û cima'etan hevdû kafir kirin û golkên taze ji şîr vebûyî li nav çavên hevdû dan, hingê mezinahî jinav çû û qedr û qîmet pelixî û heybet û ubûhet hilweşiya û zêdegavên neheq ew ummeta pêşrew û pêşkar kêm kir heta ku rûvî û gorî li çêrîngeha wê da ketin geşt û seyranê; û bê qîmetên wa dorûberan û ewên ji rehma Xwedê dûr û yên xelk ji wa nerhet di 'erd û welatê wê da geriyan, vêca heyî û serweta wê talan bû û bi qedr û qîmetên wê ji qîmet ketin û şerefa wê ket ber dilovanî ya xirabkaran; û hilweşan di pey hilweşanan ra hatin û şikestin li pey şikesta ra; û ew goherîn û serûbino bûnên kevin di Endulus û Buxara û Semerqend û Taşkend û Bexdayê û li vê paşîyê ra jî di Filstîn û Efxanstanê da ...

Heta ku ketive wî halî ku di'a û gazî dikê lê

ketine ber dijwartirîn nerîşan û pê çekirina teşuwêşê di jiyana wan ya dînî û xebata 'ilmî da pîstirîn hucûm anîne ser wan, û hema bêje eve evê hucûmê kêm maye fêkîyê xwe bidê û desthata xwe nîşan bidê; ma vêca gelo di vî halî da neheqî ye ku sef û rêzên xwe ser hev da bişdênê û irtbat û peywendên xwe qahîm bikê, halhale herçend ku mezhebên wê ji hev ferq in, lê belê digel wê yêkê di serkanîyê da şirîkê hev in ku Qur'an û sunnet e, û di baweriyan da şirîkê hev in: Baweriya bi yekbûna Xwedê û pêxemberîyê û qiyametê, û her wiha yêk in di qebûl kirina nimêj û rojî û hec û zekat û cihad û helal û heramên şerî'etê da; û di hez kirina Pêxember û Ehlê Beyta wî da (selewat û selamên Xuda li ser wa bin); û di xwe berî kirina ji dijminê wa da jî şirîk in. Ixtilaf û newek yêk bûna kêm an zêde di nav wan da

have yek dest û çarîna bi have yek bedeli je hatiye xeber dan, hikmeta wê ev bê ku işare bikê bal vê heqîqetê ve.

Heqîqet ev e ku ji kevin da ‘alim û zanayên dînî yên firqe û mezheban hebûne ku li rex hev jiyane, bêy wê yêkê ku cirrekêş di nav wan da hebê û rabin hev û ji hev birevin, ne hema ew, belkî gelek caran arîkarî ya hev kirine, hineka kitêbên hineka şerh û haşî jê ra nivîsîne, çi kitêbên 'eqîdê û çi yên fiqhî û şerî'etê; hineka li bal hineka xwendiye û hineka seydatî ji hineka ra kiriye, û bîr û bawerîyê hev qayîm kirine, û hineka icaza riwayeta hedîsê daye hineka, û hineka icaze daye hineka ku ji kitêbên mezheb û bira wî riwayeta bigêrê; û hineka dûv hineka ra nimêj kiriye û bûne me’mûm û yên dî paqij dane nîşan dan û hineka ji durustiya mezhebê hinek dî axiftine:

tarîxî li ser vê arîkariya kûr û berfreh hene, û ji kevin da zanayên Musilman bi vê hevgirtinê ve dersa mîras û ferhenga Îslamî dane, û baştirîn misal û mînak di azadiya dînî da êxistine ber çavan; û di ber vê arîkarîyê ra jî hay ji dubendîyê mane û qedr û qîmet ji wan ra danîne. Hema birastî ne tiştek zehmet e ku zanayên ummetê li hev kom bibin û bi rihetî û bi niyetek pak û safî li ser meseleyekî niqaş û got û bêjê bikin; ji wan meselên birr û koma ixtilaf têda heyî da her birrek nas bibê digel delîlên birra dî û kifş bibê kî çi delîl heye.

Her wiha gelek baş û ber 'eql e ku her birr û komek ji wan bawerîyên xwe bavêjin meydanê û nêrînên xwe yên fikrî û fiqhî di haletek temam yê azadîyê da, eşkere jê baxivin; da ku pûçî ya wa tohme û şubhe û boxtanên li dijê

ewe wek çewa heyî has bike û li ser şikle we ye durust bûyînê. Û Xwedê xweyê li hev hatinê ye.

1- Ev birra Ce'feriye ya Imamiye, di zemanê hazir da birr û komek mezin e ji Muslimanan; û êjmara wan dorûberê çarêka Muslimana ye, û ji nezer tarîxî ve rreyê wan dikêşê bal ewiliya Îslamê ve; roja ku ayeta sûretê 'Beyyîne' hat xwarê ku kerem kir: **«Birastî kesên îman anîn û karê qenc kirîn ew baştirînê mexlûqa ne»**[1] hingê Pêxember (s.e.a) di huzûra sehaba da destê xwe danî ser milê 'Elî yê korê Ebû Talib (selamên Xwedê lê bin) û got: 'Ey 'Elî! Tu û şî'a te ne baştirînê mexlûqan'. [2]

Ji dîtina vê hedîsa Pêxember ra (s.e.a) ji nimûne ra binêrin tefsîrên jêrî di tefsîra ayeta jorî da: "Tefsîra Teberî (Cami-ul beyan), Durer-ul Mensûr, ya pir zana Sîyûtî yê Şafi'î, Tefsîra Rûh-ul Me'anî, ya Alûsî yê Bexdadî yê

u Pakistan u Efxanistan u Hinde da dijîn, u êjimarek gelek ji wan jî di welatên Xelîc û Turkiye û Sûriye û Lubnan û Rûsîye û dewletên ji wê vebûyîn da hene û her wiha bilav bûne û çûne dewletên Ewrûpa wek: Înglîz û Elman û Firansê, û her wiha di Emrîka û qarre/parzemîna Efrîqa û welatên rojhilata Asîyayê da hene. Ew di wa welata da xweyê mizgeft û bingeh û merkezên 'ilmî û ferhengî û komelayetîyê ne.

3- Ji her nejadekî di nav wan da hene û xweyê eşkal û enwa'ê luxet û zimana ne, û di kêleka birayên xwe yên Musilman da ji birr û mezhebên dî bi selametî dijîn û hej hev dikin. Û bi pakî û durustî di hemî derfet û kar û baran da arîkariya wan dikin û ev ders ji Qur'anê û Pêxember (s.e.a) girtine; ayeta Qur'anê kerem dikê:

Pêxemberê giranqedr jî (s.e.a) kerem kiriye: «Musilman li beraberê yên xêncî ji xwe yêk dest in». [6] Û kerem kir: «Bawerdar wek yêk bedenê ne». [7]

4- Ewa di dirêjiya tarîxa Îslamê da biryarên bilind û ronahî hebûne ji bo berevaniya Îslamê û ummeta Musliman. Her wiha ewa hukumet û dewlet hebûne ku ji ferhenga Îslamî ra xizmet kirine û zana û xwey fikr hebûne ku pê nivîsîna bi seda hezar kitêbên biçok û mezin şirîkatî kirine li dewlemend kirin û zengîn kirina wê mîrasê, ewa Îslamê di cî da hiştî; ewa di behsên: tefsîr û Qur'an û hedîs û 'eqîde û fiqh û usûl û diraye û rical û felsefe û we'z û hukumet û komel û ziman û edebê da kitêb nivîsîne, ne hema di va behsa da kitêb nivîsîne, belkî di: tib û fîzîk û kîmiya û hesab û

“Keşf-uz Zunûn”, ya Efendî; Mu'cem-ul Mu’ellifîn, ya Kehhale; “E’yan-uş Şî’e”, ya Seyyid Muhsinê Emîn el- 'Amilî, û ...).

5- Ewa bawerî heye bi Xudayê tek û tinê; Ewê bê himber û bê ihtiyac, ku ne welidiye û ne jê hatiye welidandin û qe tiştek wek Wî nîne. Ew, Ewî berî zanin ji cism bûnê û ji hebûna rûy û cih û zeman ji Wî ra, û goherîn û bizav û hereket û pêlil çûn û jor da hatin û tiştên nelayiqê celal û cemal û kemal û pakiya Wî ji Wî ra çênakin.

Û xweyê vê bawerîyê ne ku hema Me'bûd (ewê 'ibadet jêra tê kirin) Ew e û ne xêncî Wî, û hukm hema hukmê Wî ye û şerî'et ji Wî bi tinê ra ye û ne ji kesek dî ra ye. Û bawer dikin ku şirk bi hemî reng û şiklên xwe ve, çi xefî û çi celî, zulmek mezin e û guneheke ku lêborîn û

Ew nisbeta zulm û zurgoyî û pûç û bêhûdetîyê bal Xwedê ve nadin, Xwedê bilindtir e ji wan sifetan.

Ew nisbeta gunehên mezin û xirabiya nadin bal pêxemberên pak ve, ku ji hemî nebaşiya dûr in.

6- Baweriya wan ew e ku Xwedê durustkarê şehreza ye, her tişt bi durustî û hikmet çêkiriye, qe tiştek bê feyde çênekiriye, çi bêcan û çi giya û çi heywan û çi insan û çi 'erd û çi 'esman; çiko çêkirina bê feyde dijê 'edalet û hikmetê ye, û ew jî vêca jinavberê uluhîyyetê ye, ew xudatî ya ku lazimê wî ye ku hemî kemal ji Xwedê ra bin û Xwedê ji hemî kêmasiya dûr û berî bê.

7- Û baweriya wan ew e ku ji wî wextî ve ku

pêxemberan: Adem û Nûh û Ibrahîm û 'Îsa û Mûsa û hinek dî ne ku behsa wan an di Qur'ana pîroz da hatiye, an jî sunneta şerîf ji nav û halê wan xeber daye.

8- Û li ser vê bawerîyê ne ku kesê gohdarê Xwedê bê û destûr û fermanên Wî di hemî halên jiyanê da pêk bênê ew gihaye xilasîyê û serfiraz bûye û musteheqê pesn û xêrê ye, herçend 'evdek Hebeşî bê. Her wiha kesê bê emrî ya Xwedê bikê û destûrên Wî piş gohê xwe ve bavêjê û wa kar û 'emelên ne gorekî hukmên Xwedê bi cî bênê, ewî ziyan dîtiye û xusiriye û li helakê çûye û musteheqê lome û 'ezabê bûye, her çend mezinek Qureyşî bê, wek çewa ev gotin di hedîsa şerîf da hatî.

Û ew bawer dikin ku cihê xêr û 'ezab danê roja qiyametê ye, ew roja ku hesab û mîzan (kêşek)

Muhemmede kore 'Eddullahe kore 'Eddul Mutellib e (selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin). Ewê Xwedê Te'ala ew ji xeletî û şimtînan parastîye û ew ji hemî gunehên biçok û mezin paşda dayîye, hem pêşiya pêxemberîyê da û hem piştî pêxemberîyê, hem di mesela teblîx û ragihandinê da û hem di tiştên dî da. Û Qur'ana bi qedr û qîmet jê ra rêkir da heta hetayê bibê esas ji jiyana mirov ra.

Vêca ewî (selewat û selam li ser wî û alê wî bin), risalet û peyama Xwedê teblîx kir û ragihand û bi durustî û ixlas emanet gihand cihê wê û di vê rêkê da heçî tişta hebû, hûr û gir, fida kir.

Û Şî'a, derheq tarîxa Pêxember (s.e.a) û kesayetî (şexsîyet) û hal û ehwal û taybetîyên wî û mu'cizên wî da bi dehan kitêb û nivîsok

ya wî di serpêşiya hezretê 'Elî da hinek ji sehabîyên giranqedr ew kom kirin û ji dil parastin û baş ragirtin û herf û kelîme û sûret û ayetên wê êjimartin û pişt û pişt û nesl û nesl ew gêran û neql kirin. Ew hema evahe ye ku îro hemî birr û komên Muslimana şev û roj ewê dixwinin; ne tiştek jê kêm bûye û ne lê zêde bûye û qet xeletî û goherîn neketiye têda. Zanayên Şî'a vê derheqê da gelek kitêbên kurt û dirêj nivîsîne (binêrin: Tarîxa Qur'anê, ya Zencanî; û et- Temhîd fî 'ulûm-il Qur'an, ya Muhemmed Hadî yê Me'rîfet ...).

11- Û li ser vê bawerîyê ne ku, dema wextê ji dinya çûna Pêxemberê Xwedê hezretê Muhemmed (s.e.a) nêzîk bû, 'Elî yê korê Ebû Talib ji xelîfetiya paş xwe ra û ji imametiya Muslimanan ra danî, da ku pêşkarî ya wan ya

kesa bûn. Û vê derheqê da gelek ayet hatin xwarê.[8]

Her wiha hingê Pêxember (s.e.a) ji xelkê xwest ku pê dest danîna ser destê hezretê 'Elî, bey'etê digel wî bikin, vêca ewa ku giregirên muhacir û ensaran li pêşiya wan da bûn digel wî bey'et kirin (binêrin: el- Xedîr, ya pir zana Emînî, ku vê derheqê da gelek gotin ji

---

[8]- Ayet ev in: Ayeta teblîxê: “Ya eyyuhe-r resûl-u bellîx ma unzîle îleyke mîn rebbîk ... Ey Pêxember ewa ji alîyê Xudayê te ve ji te ra hatiye ragihîne, û eger tu wê nekî, te risaleta Wî ranegihandiye, û Xudê wê te ji xelkê biparêzê, birastî Xwedê koma kafira rêrast nakê”. Maide / 67.
Ayeta ikmal: “Elyewm, ekmeltu lekum dînekum ... Îro min dînê we ji we re kamil kir û min qenciya xwe li ser we temam kir û ez bi navê dîn ji we re bi Îslamê razî bûm. Maide / 3

ew kar ferz u lazim in ku Pexember (s.e.a) pe radibûya û dikira; karên wek: pêşkarî û rêrast kirinê; û terbiyet û 'elimandinê; û ronahî kirina hukmên şerî'etê; û rakirina muşkilên fikrî yên asê û bi zehmet; û derman kirin û çare dîtina ji kar û barên muhim û girîng yên civak/komelê. Çiko ev karên he piştî Pêxember (s.e.a) hêviya imam û xelîfê paş wî ve ye, lazim e ew imam bi awayek wereng bê ku xelk baweriya xwe pê bênin û pişta xwe pê girêdin, da ji ummetê ra pêşkarîyê bikê û ewa bi alîyê selametîyê ve bibê. Vêca nixwe şirîkê Pêxember e di kêr hatin û sifeta da (û xwe parêzî û zanîna berfreh jî ji wan sifeta ye). Çiko wehy û pêxemberî jê der, wekî dî di kêr hatin û berpirsiyariya da (mesûliyet) şirîk e digel wî. Lê di wehy û pêxemberîyê da ne şirîkê wî ye çiko pêxemberî pê hezretê

rine.

13- Û li ser vê bawerîyê ne ku ihtiyac û niyaza ummetê bi pêşkarê rênas û imamê bê guneh dikê lazimê xwe ku çênabê hema Imam 'Elî tinê ji xilafet û imameta paş Pêxember ra (s.e.a) were danîn, belkî lazim e ev pêşkariya henê dewam bikê û ji zemanek dirêj ra bimînê, heta Îslam reh û rîşên xwe bavêjê û esas û binyatên şerî'etê bên parastin û ruknên wê di beraberê xeterên ku gefa dikin li bawerîyên dînî û Xudayî qahîm bibin; û da kiryar û gotinên wan di dem û zemanên ne wek yêk da hemî li ser hev bibê berhevokek 'ilmî ya baş û bernameyek berketî ji ummeta Îslamî ra ji zemanên paşvetir ra.

14- Û baweriya wan ev e ku Resûlê Xwedê hezretê Muhemmed (s.e.a) ji ber vê yêkê û ji

/ xelîfe ku hemî ji Qureyş in, hebin wê dîn berdewam / rawestayî / qahîm û xurt bimînê. (Di hinek kitêba da jî şûna Qureyş da «Benî Haşim» hatiye. Her wiha di kitêbên şi'r û feza'il û menaqiban da navê wa jî hatiye).

Û ev hedîs herçend deqedeq li ser duwazdeh imaman ku hezretê 'Elî û yazdeh kes ji zarokên wî ne, ne delîl in; lê belê xêncî li ser baweriya Şî'ên Ce'ferî rêk nakevin û çi şîrove kirinên durust ji gotina wan pêve vê derheqê da mirov nikarê peyda bikê (binêrin: kitêba «Xulefa-un Nebî» ya Ha'irî yê Behranî).

15- Û baweriya Şî'ên Ce'ferî ew e ku duwazdeh imam ev in:

Imam 'Elî yê korê Ebû Talib (kormamê Pêxember (s.e.a) û zavayê wî, zelamê Fatima

Imam Mûsa korê Ce'fer (Kazim).

Imam 'Elî korê Mûsa (Riza).

Imam Muhemmed korê 'Elî (Cewad, Teqî).

Imam 'Elî korê Muhemmed (Hadî, Neqî).

Imam Hesen korê 'Elî ('Eskerî).

Imam Muhemmed korê Hesen (Mehdî yê mew'ûdê muntezer) selamên Xwedê li ser hemîyê wa bin. [9]

---

[9]- Edîb û zanayan derheq eva duwzdeh Imamên Ehlê Beytê da gelek şi'r û gotin hene. Berê xwe bidin: Dûlge, ya Dawûdê Qerewlûsî û Cewşen, ya Seyyid 'Elî yê Huseynî yê Bohtî. Ji nimune ra emê duduyan bînin:
Heskefî yê Henefî dibêjê:
حيدرة و الحسنان بعده ... ثم على و ابنه محمد ... و جعفر الصادق و ابن جعفر موسى و يتلوه على السيد ... اعنى الرضا و ابنه مجمد ... ثم على و

ji ber ku ew in xweyê zanîna berfireh ku kalkê wan (ceddê wan) ji wan ra mîras hiştî; û destûra hejê kirina wan û pey ketina wan dayî; hingê ku Xwedê kerem kirî:

“Ey Pêxember, bêje: Ez çi kirê (ucretê) ji we naxwazim li ser risaleta xwe, xêncî ji hez kirina ji mirovên min yên nêzîk”. [10]

Û kerem kiriye: **“Ey gelî kesên we bawerî anîyî, hay ji navbeyna xwe û Xwedê hebin û digel rastan/rastbêjan bin”.**[11] Vê derheqê da binêrin kitêbên hedîs û tefsîr û sihahan.

'Arfê hêja Ehmedê Xanî jî di kitêba Nûbihar da dibêjê: “Xelîfe car in, duwazdeh Imam in ey Musilman

'eqîde û fiqh û exlaq û adab û tefsîr û tarîx û ... pê wê zanîna xwe ya kûr û dîtina xwe ya durust ferhenga ummetê dewlemend (zengîn) kirine. Û her wiha bi gotin û kiryarên xwe birrek ji jin û zelamên berketî û qenc û baş terbiyet kirine û gihandine, ew kesên her kesî ji başî û zanîn û xweş exlaqiya wan axifitîye.

Û bi bawer in ku herçend ew ji pêşkêşiya wan ya siyasî hatine paşda dan, lê belê ewa berpirsyarî û mesûliyeta xwe ya fikrî bi baştirîn şikl eda kirine û pêk anîne; çiko ewa ruknên bawerîyê û sitûnên şerî'etê ji xeteran parastine.

Û eger ummetê rê ya wan vekira û mecal bida wan ku berpirsyariya xwe ya siyasî ku Pêxember (s.e.a) bi destûra Xwedê Te'ala ew dabû wan bi cî bînin û pêve mijûl bibin, bê sik

Heydel, ku di 5 cîda da hatiye nivîsîn.

17- Ji ber vê yêkê û ji ber delîlên zehfî yên dî yê 'eqlî û neqlî ku di kitêba da hatiye gotin, ew li ser vê bawerîyê ne ku pey ketina Ehlê Beytê lazim e û gereke mirov li ser rêka wan biçê; çiko ew e rêka ku Pêxemberê Xwedê (s.e.a) ji ummetê ra kêşayî û wesiyet kirîye ku bi wê rêkê ve biçin, çewa ku di hedîsa mutewatira 'Seqeleyn' da hatî, kerem kiriye: "Innî tarik-un fîkkum-us seqeleyn, kîtabe-llahî we 'itretî ehlî beytî, ma în temessektum bîhîma len tezîllû be'dî ebeda" – "Rastî ev e ku ez du tiştên giranbiha di nav we da dihêlim; kitêba Xwedê û binemala xwe, Ehlê Beytê, çiqa ku hûn xwe bi wan bigirin, qet hûn li rê winda nabin".

Ev hedîs Muslim di kitêba xwe ya 'Sehîh'ê da riwayet kiriye û ji xêncî wî jî bi dehan

kitêbên hedîs û tarîxê, ya her du birra).

18- Û Şî'ên Ce'ferî bi bawer in ku gereke ummeta Îslamî li ser va mesela got û bêjê bikin û baxivin, bêy wî qasî ku dijûna bikin û hev bişkînin, û bêy wê çendê ku hevdu bêxin ber ithamê û meselê tarî bihêlin. Û dibêjn ji 'alim û zanayên hemî kom û birrên Muslimana ra lazim e di civatên 'ilmî da berhev bibin û bi ixlas û pakî eva mesela bavêjin ber lêkolînê û li ser baxivin, û bi biratî goh lê bibin ewê ya birayên wan yên Ce'ferî dibêjn û delîla wan ji kitêba Xwedê û ji sunneta durust û mutewatir û 'eqlê rast û tarîxê seh bikin û hilsengînin, kanê derheq meselên siyasî û komelayetî/civakî yên zemanê Pêxember (s.e.a) û piştî wî çi dibêjn.

19- Baweriya Şî'ên Ce'ferî ew e ku hema bi

pêkve adil in ji her cineti ve, û ew ne sêr we hindê ra ne ku hinek ji kar û kiriyarên wan bikevin ber lêkolînê, çiko ew jî beşer in xelet jî û rastî jî her du ji wan çêdibin. Tarîxê behs ji hineka kiriye ku heta di zemanê Pêxember (s.e.a) bixwe da jî ji rê xalifîne. Ne hema ev, belkî Qur'ana pîroz di hinek sûret û ayetên Qur'anê da ji vê meselê axiftiye; hûn dikarin vê derheqê da binêrin sûretên: Munafiqûn, Ehzab, Hucurat, Tehrîm, Feth, Muhemmed û Tewbe.

Vêca nixwe lêkolîn û axiftina durust derheq kiryarên hinek ji wan da nabê kufr, çiko mîzan û kêşeka îmanê û kufrê eşkere ye û nuqta despêka herduka ronahî ye; ew jî qebûl kirin û qebûl nekirina tewhîd û risaletê ye; û qebûl kirin an inkar kirina wa tişta ye ku di dîn da sabit in (û inkara wê bibê sebebê inkara

sehaban qenc û qenckar bûne û layiqê bihadan û ihtiramê ne û xwey qedr û qîmet in.

Lazim e ev jî bê gotin ku, evahe ku ew jî ketine ber lêkolînê, feqet û tinê ji ber vê yêkê ye ku sunnet û hedîsên durust yên Pêxember (s.e.a) bên nas kirin û gotinên cihê bawerîyê were dîtin, çiko wek çewa kifş e û herkes pê dizanê, piştî Pêxember (s.e.a) gelek derew û bêbextî li ser wî (s.e.a) hatine çêkirin, û Pêxember (s.e.a) bixwe jî ji vê yêkê xeber daye, û hema ev mesele ye ku bûye sebeb heta gelek zana û ‘alim ji her du birra wek Sîyûtî û ibn Cewzî û ... kitêbên hêjayî li vê derheqê da binivîsin, heta hedîsên ku bi durustî û rastî ji Pêxemberê Xwedê (s.e.a) riwayet bûyîn bên veqetandin ji wa yên destçêkirî û bi derew nisbeta wan dayîn bal Pêxemberê Xwedê (s.e.a) ve.

Mehdî ku bi naznavê (kunye ya) «Eb-ul Qasim» hatiye nas kirin. [12]

Komekî ji Muslimanên cihê bawerîyê ew dîtine û derheq ji dayîk bûn û taybetîyên (xusûsiyet) wî û imameta wî da xeber dane; û ji alîyê babê wî ve hatiye gotin ku ew imam e, û pênc sala piştî ji dayik bûnê ji ber çavan winda bû, çiko dijminan xwestin ewî bigirin û bikujin û ji ber ku Xwedê xwest ewî bihêlê û xwedî bikê da di axirîka zeman da hukmeta durusta Îslamî bi awayek berfireh danê, û da 'erdê ji zulm û xirabîyê paqij bikê, piştî ku tejî dibê ji zulm û fesadê.

'Emr û temenê wî yê dirêj jî ne tiştek xerîb e û çi sebeb jî ji 'ecêbmanê ra nînin, çiko evahe heqîqet e ku Qur’ana pîroz behsa saxiya

her dijî û sax e.

Vêca Xwedê her tiştî dikarê bikê û hemî kar jê tên û tiştek nikarê xwest û viyana Wî paşda bidê. Ma gelo derheq hezretê Yûnus (s) negotiye:

“Eger ew ne ji tesbîhgoyan bûya Ω Wê heta roja qiyametê bimaniya di zikê wê masîyê de”. [13]

Û komek berketî ji ‘alim û zanayên giranqedrên ehlê sunnet gotine ku Imam Mehdî ji dayika xwe bûye û niha heye û navê dê û babên wî jî dane qelemê û behsa sifetên wî kirine. Wek:

A- 'Ebd-ul Mu’minê Şeblencî yê Şafi’î, di kitêba xwe da, bi navê «Nûr-ul Ebsar fî Menaqib-î Al-in Nebî el- Muxtar».

C- Qunduzî ye Hanefî ye Belxî, di kitêba xwe: «Yenabî'ul Mewedde» da ku di zemanê xilafeta 'Osmaniyan da li astaneya Tirkîyê li çapê ketiye.

D- Seyyid Muhemmed Siddîq Hesen Qenûcî yê Buxarî di kitêba: «el- Iza'et-u lî- ma kane we ma yekûn beyne yedey-is sa'et».

Û ji yên vê paşîyê ra jî kitêb nivîsîne, em dikarin Dr. Mustefa Rafi'î nîşan bidin di kitêba «Îslamuna» da, ku lez ber mesela ji dayik bûnê ra derbaz bûye û heçî işkal û nerazî bûnên vê derheqê da heyîn ji halê rakirine.

21- Û Şî'ên Ce'ferî mêj dikin û rojî digirin û zekat û xumsa malê xwe didin û diçin heca mala Xwedê ya bi qedr û qîmet li Mekkehê; di 'emrê xwe da carekî pêk anîna 'emelên hec û 'umrê wacib û ferz zanin û carên dî sunnet

wek: ticaret û kirê û zewac û telaq û mîrat û terbiyet û şîrdan û çarşevê û ... li ser esasê hukmên Îslama pak û durust pêk tînin, eva hukma jî zanayên dînî bi rêka ictihad û xebatek 'ilmî ve ji kitêb û sunneta durust û hedîsên Ehlê Beytê û 'eql û icma'a ‘aliman berdest dikin.

22- Û fikra wan ew e ku her ferzekî (nimêjekî) ji ferzên roj û şevê wextek kifş kirî jê ra heye, ku pênc wext in; sibeh û nîvro û êvar û mexreb û 'eşa wextê kirina pênc nimêja ne, û ya baştir ew e her nimêjek li wextê xwe yê taybet da bê kirin; lê belê ew, mêja nîvro û êvarê û ya mexreb û 'eşayê li ser hev kom dikin; çiko Pêxemberê Xwedê (selewatên Xwedê li ser wî û alê wî bin), bêy 'ozr û bêy nexweşî û bêy hebûna baranê û bêy wê çendê ku li seferê da

bangê deranî, û delîla wî jî ev bû ku dema xelk bizanin baştirîn kar nimêj e, evahe wê ewan ji cihadê paşda bidê. Zanayê hêja Qoşçî yê Eş'erî evahe di kitêba şerha Tecrîd-ul I'tiqadê da gotiye, ev gotin di «Musennef» ya Kendî û «Kenz-ul 'Ummal» ya Mutteqî yê Hindî û kitêbên dî da jî hatiye. Wek çewa hema wî «es-Selat-u Xeyr-un Min-en Newm» li banga sibehî zêde kir halhale di zemanê Pêxember da (s.e.a) tinebû (binêrin kitêbên hedîs û tarîxê).

Û çiko şiklê 'ibadet û tiştên bi wê ve girêdayî (muqeddematên wê) girêdayî ye bi hukmê şerî'etê û izna wê ve, yanî hemî şiklên 'ibadet lazim e pê gotinek xas/taybet an 'umûmî/giştî ya Qur'an an sunnetê kifş bûbê û hatibê gotin, egerne ew dibê bid'e û li xweyê xwe tê zivirandin û li bal Xwedê qebûl nabê ... ji ber

«Muhemmed Resûlullah» hebê, an li ser dergehê biheştê nivîsî bê, muheqeq di pey ra kelîma «'Elîyyun Welîyullah» hatiye. Û evahe kelîmeyeke hişyarîyê çêdikê ku Şî'e ne hema 'Elî (s) bi xwedêtîyê nizanin belkî ewî Pêxember jî nizanin.

Û ji ber vê yêkê evahe ku ne bi niyeta zêde kirina li bangê tê gotin [14] ji wê bid'e nayê hesab kirin ku çi reh û rîşe di şerî'etê da tune.

24- Û secde dikin li ser axê (se'îd) an li ser xîzê û an li ser teht û seleberan û tiştên ji 'erdê hesab dibin û giyayê ji 'erdê derdikevê wek hêsîrê, û li ser mafûr, qumaş û tiştên xwarinê û zînet û xemlê secde nakin, evahe jî ji ber gelek hedîsa ye ku di kitêbên Şî'e û Sunniya da hatine ku: Pêxemberê Xwedê (selat û selam li ser wî û alê wî bin) 'edeta wî ew bû ku li ser ax

şaşika wî ji bin ehniya wî rakir û gotê: “Ey Bilal, ehniya xwe bi axê ve deyne (ehniya xwe deyne ser 'erdê).

Wek vê gotinê ji Suheyb û Rebah ra jî gotiye; hingê ku gotê: Ey Suheyb! Rûyê xwe dane ser 'erdê. Ey Rebah! Rûyê xwe bi 'erdê ve deyne (binêrin: Sehîha Buxarî; û Kenz-ul ‘Ummal; û Musennefa 'Ebd-ur Rezzaqê Sen'anî; û ‘Secda li Ser 'Erdê’ ya Kaşif-ul Xita’).

Û her wiha çiko Pêxember (s.e.a) gotiye: “'Erd ji min ra bûye cihê secdê û ji bona pakîyê (ji teyemmumê ra). Ev riwayeta he Sehîha Buxarî û kitêbên dî nivîsîne.

Secda li ser axê û danîna ehnîyê li ser 'erdê ji bona secde birinê li beraberê Xwedê da munasibtir e, çiko li beraberê Me'bûd da pitir

qumaş û cewahîrateh giranbiha çêdabe, hema tinê bi wê çêdibe ku mirov bi qedrtirîn cihê bedena xwe ku ehnî ye deynê ser erzantirîn tiştî ku ax e. (binêrin: kitêba: «el- Yewaqît we-l Cewahir», ya Şe'ranî yê Ensarî yê Misrî, ji zanayên sedê dehê hicrî).

Belê, ev heye ku gereke ax pak û paqij bê, û ji ber vê yêkê ye ku Şî'e qetek heriya hişk bûyî digel xwe radikin, da bizanin ku muheqeq pak û tahir e. Û çêdbê ku carina ew ji 'erdek mubarek wek Kerbelayê hatibê girtin, ew cihê Imam Huseyn, nevîyê Pêxember lê hatîye şehîd kirin. Wek çewa hinek ji sehabiyan jî di seferên xwe da ji bona secdê hinek xîza Mekkehê ji teberruk ra digel xwe dibiran (binêrin: el- Musennef, ya Sen'anî).

Lê belê Ce'ferî pêkotanê li ser vê yêkê nakin û

nadanîn ser deste çepê, çiko Pêxember (s.e.a) we nekiriye, û ew bi gotinek bê şik û deqedeq sabit nebûye, û ji ber vê yêkê Malikî jî destê xwe nadanên ser hev (binêrin: Buxarî û Muslim û Sunena Beyheqî. Û ji bîr û hizra Malikîyan ra binêrin: “Bidayet-ul Muctehid, ya ibn Ruşdê Qurtubî yê Malikî).

25- Ew di desmêjê da destê xwe ji enîşka heta bi ser tiliya dişûn, ne bervajî. Çiko ewa çewaniya desmêj girtinê ji Ehlê Beytê (s) girtine û ewa jî ji kalkê xwe (ceddê xwe) Resûlê Xwedê girtine û ew baştir ji yên dî ji karê ceddê xwe agah in, û Pêxember jî (s.e.a) we dikira. Û wek çewa xweyê kitêba Nihayet-ul Muhtac kirîye ewa jî bêjeya «îla-إلى»yê di ayeta desmêjê da [16] bi me'na «مَعَ – digel» tefsîr kirine.

Her wiha ew ji ber wî sebebê me got, destê xwe

mut'e kirin (ji wan benremend bun) vêca ucreta wan bidin wan”. [18] Û çiko di zemanê Pêxemberê Xuda da (s.e.a) Muslimana ew kar dikiran û heta zemanê xelafeta 'Omer bin Xettab nîvî jî bûyî, sehaban her we dikiran. Û ew zewacek şer'î ye û di me-selên jêrî da wek zewaca da’imî ye:

A- Gereke ewê jinê mêr tunebê, û di mehr kirinê da îcab (qirar dan) ji alîyê jinê ve û qebûl ji alîyê zelam ve ye.

B- Di wî malê digehê jinê, ku di zewaca da’imî da jêre tê gotin «mehr» û di ya ne da’imî da jêra tê gotin «ucret» wek çewa di ayeta Qur’anê da derbaz bûyî.

C- Û di girtina 'idde da (ku pişt̂i telaqê gereke jin heta wextekî ku şerî'etê danîye mêr nekê) piştî ku zelam ji jinê cida bû.

zarok ji bav û dayik ji zarok û zarok ji dayike irsê (mîratê) dibin.

Û di va tiştên xwarê da jî digel zewaca da'imî ferq dikê:

Kifş kirina wext di zewaca muweqqet da; û wacib nebûna nefeqê û hay jê mana teqsîma wextê wan li ser zelam; û mîrat nebirina di navbeyna herduka da; û lazim nebûna telaq, ji ber ku pê xilas bûna wextê hatî kifş kirin an lêborîna wextê mayî cidahî çêdibê.

Û hikmet û sebebê vê qismê zewacê, pêk anîna ihtiyaciya durust ya viyanên cinsî yên jin û mêra ye, ji wan kesan ewên bi wa çênabê û nikarin zewaca da'imî bikin. Û an zelam ji ber mirina jina xwe an sebebek dî ji zewacê bêbehr û mehrûm bûbê, û her wiha bervajîyê wê, û digel wî qasî jî viyana wî hebê ku bi şeref û

hakevin hav tekenya heram ra û hakevin hav zinayê ra û dikarê bibê sebebê parastina wî kesî ji herametîyê ewê dixwazê karê heram nekê, lê belê nikarê bi jinekî tenê xwe bigirê, an nekar bê mesrefa jinekî bidê û ...

Di her hal û karî da ev awayê zewacê li ser esasê kitêb û sunnet û karê sehabiyan hatiye danîn û sehaban muddet zemanekî ew kiriye. Û eger ew zina bûya, penah dibim bal Xwedê, me'na wê dibê ev ku haşa Qur'an û Pêxember (s.e.a) û sehaban zina helal kiribê, û di muddet zemanekî da ewên wisa kirîn zina kiribin, penah dibim bal Xwedê.

Evahe ji aliyekî ve, ji alîyê dî ve jî vêca nesxa wê (betal kirina vê hukmê) ne pê Qur'an û sunnetê ye û tu delîlên qahîm û bira li ser tunînin. [19]

seratir zanin û li pey wê ne, û meyla zewaca muweqqet nakin ewa ku di şerî'etê da jêra tê gotin «mut'e», herçend helal û şer'î ye.

Bi vê munasibetê cihê gotinê ye ku pê wa dersên Şî'a ji Qur'an û sunnet û zanînên Ehlê Beytê (s) girtine, gelek qedr û qîmet didin jinan û giranî û bihayek mezin ji wan ra hesab dikin. Û derheq kesayetî û şexsiyeta wan da û heq huqûqên wan û nexasma rabûn rûniştina digel wan li ser esasê exlaqê baş û derheq nikah û telaq û «hizanet» û şîrdan û 'ibadet û mi'emileta digel wan hukmên gelek xweş û baş û berketî di riwayetên imamên wan û kitêbên fiqhî yên wan da hene.

27- Û ew heram zanin: zinayê û lewatê û ribayê û kuştina nefsa ku jinav birina wê heram e, û vexwarina 'eregê û qumar û

(biçok û mezin) dizanin. Û her dayim dixwazin xwe ji wan dûr bigirin û çiqas ji wan bê xwe ji wan paşve didin. Û lê digerin ku pê nivîsandina kitêb û cizok û nivîsokên exlaqî û terbiyetî û pê çêkirina celese û civatan û pê xutbên îniya û axiftinan û ... xelkê ji wan tiştên heram û nebaş paşda bidin.

28- Û gelek xemê dixwin ji exlaqên hêjayî û berketî ra û muştaqê we'z û şîreta ne ku seh bikin û ji wê çendê ra civat û celesan li mal û mizgeftan da datînin, û da ku we'z û şîretan goh lê bibn di munasibetên muxtelif da li dora hev kom dibin û ewan di'ayên pir feyde û rih perwerdeker ku ji Pêxember (s.e.a) û imamên Ehlê Beytê (s) hatine dixwînin; wek: du'a Kumeyl û ebû Hemzeyê Sumalî û du'aya Semat û du'aya Cewşenê Kebîr (ku ji hezar

29- Û ew qedr û qîmet didin qebr û mezarên Pêxemberê Xwedê (s.e.a) û Imamên Ehlê Beytê û zuriyeta wî ya pak ku li Medîne ya Munewwere da li «Beqî'»ê da ne; wek mezarên: Imam Hesenê Mucteba û Imam Zeyn-ul 'Abidîn û Imam Muhemmedê Baqir û Imam Ce'ferê Sadiq (selamên Xwedê li ser wan bin).

Û mezarê Imam 'Elî (s) ku li Necefa Eşrefê da ye.

Û mezarê Imam Huseyn korê Imam 'Elî (selam li wan bin) û birayên wî û korên wî û pismamên wî û hevalên wî yên roja 'Aşûrayê digel wî şehîd bûyîn li Kerbelayê.

Û mezarê Imam Hadî û Imam 'Eskerî ku li Samirrayê ne.

ku li Demişqê di Suriyaye da ye.

Û mezarê Seyyîde Nefîse ku li Qahira Misrê ye.

Û evahe ji ber qedr û qîmet dana Pêxember e (s.e.a) çiko qedrê mirova di zarokên wan da ye û bihadana zarokên mirov bihadana mirov e. Û çiko Qur'ana pîroz jî pesnê Alê 'Imran û Alê Yasîn û Alê Ibrahîm û Alê Ye'qûb daye, û hinek ji wan Pêxember jî nebûne, û kerem kiriye: **"Ew zuriyeteke ku hinek ji hineka ne".** [20]

Û her wiha ev qedr girtin ji ber wê yêkê ye ku dema hineka gotîn: **"Emê avahiya li ser qebrên Eshabê Kehf çêkîn û mizgefta ava kîn da ku li bal wan 'ibadet ji Xwedê ra bê kirin"** [21] gotina wan meqbûl hat zanîn û karê wan şirk nehat hesab kirin; çiko mirovê Muslimanê bawerdar hema ji Xwedê ra diçê

Vêca ne wisa ye ku kesê li piş «Meqam» nimêj bikê ewî ji meqam ra nimêj kiriye, û her wiha ewê pê karê «Se'ya li navbeyna Sefa û Merwe yê da» ji Xwedê ra 'ibadet dikê, ne wisa ye ku ji du çiyayên Sefa û Merweyê ra 'ibadet kiribê. Mesele ev e ku Xudayê Te'ala ji 'ibadetê xwe ra hinek cihan pîroz û mubarek kirine û veqetandine ku bi me'nayekî bal Xwedê bixwe ve tên nisbet dan. Vêca hinek roj û cih xweyê hêjan û paqijiyekî ne, wek «roja 'Erefê» û «'erdê Minayê» û «'erdê 'Erefatê» û sebebê evê hêjan û berketinê hema ew e ku ew roj û cih, yên Xwedê hatine hesab kirin.

30- Û hema ji ber vê yêkê ye ku Şî'e jî wek Muslimanên dî ku hay ji qedr û qîmetê Pêxember (s.e.a) û Ehlê Beyta wî mane, ziyareta qebr û mezarên Ehlê Beytê karek

xwendina ziyaretê da qencî û seratî yên xweyê wan mezaran tênê bîr û jê xeber didê; cihad û xebata wan, nimêj kirina wan, zekat dana wan, û ew zehmetî û nerhetiya di vê rêkê da ser wan da hatî. Xêncî ji vê jî vêca Pêxemberê giranqedr jî (selat û selam li ser wî û alê wî bin) xem ji vê xwariye:

Ma piştî şehîd bûna Hemze ne ew bû ku got: “Ewên ji Hemze ra bigirîn nînin?”

Ma ne ew bû ku ji korê xwe Ibrahîmê 'ezîz ra girî?

Ma ne ew bû ku bi qesta ziyareta qebran diçûya Beqî'ê?

Û ma ne ew e yê gotî: “Herin ziyareta qebra, çiko axiretê tênê bîra we?” [23]

Belê, hema birastî ziyareta qebr û mezarên

Ev kar karek nisam û ferhengî û eqlam ye, vêca hema ji ber wê ye ku xelkên cihanê bîra mezinên xwe sersilsile yên ferhenga xwe sax dihêlin û bi hemî reng û eşkalan, munasibetên girêdayî bi wan ve sax dihêlin. Çiko ew dibê sebeb ku iftixar û xwe navdana wan ji wan ra bimînê û ser iltifata xelkê ve zêde dibê û li dora wê û qîmet û bihadana wê kom û berhev dibin.

Hema evahe bi xwe ye sebebê wê yêkê ku ayetên Qur'anê berê xelkê dayî bîr û hizrên pêxemberan û ewlîya û qencan û qisetên wan gotîn.

31- Û Şî'ên Ce'ferî bi Pêxemberê Xwedê (s.e.a) û Imamên pak yên Ehlê Beyta wî daxwaza şefa'etê dikin; û ewan ji xwe ra li bal Xwedê dikin mehderkar ku Xwedê li gunehan biborê,

rehm e”. [24]

Û kerem kiriye: **«Û wê Xwedê ewqas bidê te heta tu razî bibî».** [25] Mexsed dana heqê şefa'etê ye ji Pêxember ra.

Vêca çewa çêdibê ku Xwedê derece û heqê şefa'eta ji gunehkara re bidê Pêxember (s.e.a) û her wiha meqam û merteba «wesîle» û mehderkarîyê bidîyê, vêca nehêlê xelk şefa'etê jê bixwazin, an nehêlê Pêxember ji vî meqamî û ji vê mertebê istifade bikê û behrê wergirê?!

Ma ne Qur’an e ku derheq zarokên Ye'qûb da dibêjê ku şefa'et (mehderkarî) ji babê xwe xwestin û gotin: **«Ey bab! Lêborîna gunehên me bixwaze, çiko birastî em xelet bûne -gonehkar bûne-».** [26] Vêca ewî

Û kes nikare eve gotine beje ku: Pêxember (s.e.a) û Imamên pak û paqij mirine, nixwe du'a xwestina ji wan bê feyde ye; çiko pêxemberên Xwedê sax in û nexasma Pêxemberê me (selat û selamên Xwedê li ser wa bin), ewê Xwedê derheq wî da gotî: **«Û bi vî awayî me hûn kirin ummeta navincî (weset) da ku hûn li ser xelkê şahid bin û Pêxember jî şahd bê li ser we».** [28]

Û kerem kiriye: **«Bêje: Dê bikevin kar, wê Xwedê û Pêxember û bawerdar kar û 'emelên we bibînin».** [29]

Û ev ayet û me'na wê berdewam e heta roja qiyametê, wek çewa roj û heyv û şev û roj berdewam dimînin.

Pêxember (s.e.a) û Imamên Ehle Beyte dikin cejn û rojên wefata wan dikin şîn, û di wa rojan da behsa qencî û seratî û karên wan yên berketî dikin, û ewa tişta dibêjn ku bi awayek durust gihaye destê wan, di vê meselê da li ser rêka Qur'anê diçin ku behsa seratî û qenciya Pêxember (s.e.a) û pêxemberan dikê û ewa didê ber çehva û nîşan didê da ku mirov bikevin pey wan û dersê ji wan wergirin û pê wan rêrast bibin.

Lê belê ew di va merasiman da xwe ji karên heram didin paş, karên wek tevhev bûna jin û mêran; û xwarin û vexwarina heram; û zêde gotin û ji hed derbaz kirina medh û pesn danê; û ew tiştên dî yên rêk nakevin digel rihê şerî'eta Îslamî ya pak. Her wiha ewa kara nakin ewên ayet an riwayetek durust an qa'ide û esasek rast li ser wê nebê delîl

le bele dîsa ji ne nivîseren wan û ne peyrewên Ehlê Beytê navê «sehîh» nedanîne ser. [30]Û ji ber vê yêkê feqîh û zanayên Şî'an ne li pey vê çendê ne ku bêjin hemî hedîsên wî sehih û durust in, belkî xwe bi wa digirin ewên durustiya wan li bal wan sabit bibê, û wê ya «sehîh» an «hesen» nezan bin xwe pê nagirin û ewa gorekî qa'idên 'ilmê hedîsê û 'ilmê diraye û ricalê xwe pê girtina wê ne durust bê terk didin.

34- Her wiha di behsên 'eqîde û fiqh û du'a û exlaq da ji hinek kitêbên dî behrê dibin ku gotinên Imamên pak di wan da hatine nivîsîn, wek: «Nehc-ul Belaxe» ku Seyidê Rezî ji xutbe û name û hikmetên kurt yên Imam 'Elî (s) berhev kiriye.

Û wek: Nivîsoka «Huqûq» û «Sehîfa

yên Sunnî da ji natîne bêy te'essub istîrade je dikin. Û nivîsînên wan ji kevin da heta niha şahid in li ser vê gotinê; ku hedîs ji sehabên Pêxember (s.e.a) û jinên wî û sehabên meşhûr wek Ebû Hureyre û Enes û ... têda hene. Elbet bi şertê ku sehîh bin û digel Qur'anê û hedîsa sehîh û 'eqlê durust û icma'ê ne muxalif bin.

36- Bîr û hizra wan ew e çi bela û nexweşî yên ser Muslimana da hatî ji ber du tişta ye:

Yêk- Paş gohê xwe ve avêtina pêşkariya Ehlê Beytê ku layiqê pêşkarîyê ne, û goh nedana rênimûnî û hîn kirinên wan, nexasma di tefsîra Qur'anê da.

Du- Cidahî û ji hev vebûn û ixtilaf û cirrekêşa di navbeyna mezheb û birên Îslamî da.

Û ji ber vê yêkê illeh Şî'e xebitîne ku yêkatî û

Û kitêba «Mecme' el- Beyan» ya Şêxê Tebersî, di behsa tefsîra Qur'anê da, ewa giregirên zanayên Ezherê pesnê wê dayîn.

Û kitêba «Tecrîd-ul I'tiqad» ya Nesîruddînê Tûsî di behsa 'eqîdê da, ew kitêba ku 'Ela-uddînê Qûşçî yê Eş'erî şerh û şîrove kirî.

37- Û giregirên zanayên Şî'an we difikirin ku lazim e got û bêj di navbeyna zanayên mezhebên Îslamî da bê kirin, di behsên fiqh û 'eqîde û tarîxê da û her wiha hevfikrî ya wan di mesela Muslimanên vî zemanî da dixwazin. Û lazim zanin ku xwe vedin ji dijwar kirina boxtana û jehrawî kirina hewayê, da ku 'erdek munasib peyda bibê ji nêzîk bûna ummeta Musilman ra û durahî ya wan ji hevûdu kêm bibê, da ku pêşî li dijminê Îslam û Muslimana

didin xebatên 'ilmî yên mezheb û birên Îslamî, û eger kesekî gorekî mezhebê xwe 'emel kiribê 'emel û karê wî ji wî ra caiz zanin û we hesab dikin ku teklîfa xwe pêk aniye û “berî-uz zemme” ye, eger ji mezhebê xwe derkevê û were ser mezhebê Ce’ferî, 'emelê wî yê pêşda jêra caiz bûye; nimêj û rojî û hec û zekat û nikah û telaq û kirîn firotin û ... vêca hingê dubare kirina wan 'emelan ne lazim e û eger gorekî mezhebê xwe yê pêşda nikah kirbê an telaq dabê dubare kirin jêra nelazim e.

Û ew digel birayên xwe yên Musilman li hemî cihî wisa dijîn heçweku/qey birayê hev bin û mirovên hevdu bin.

Belê ew, rêk nakevin digel mezhebên ku patexwera çêkirine, wek: Behayî û Babî û Qadiyanî û ... û digel wan muxalifet dikin û

Yek- Ji bona parastina can û xwîne ye ku jînav neçin.

Du- Ji bona parastina yêkbûnê ye di nav Muslimanan da ku ji hev bilav nebin.

38- Û ew wereng fikr dikin ku yêk ji sebebên paşketina îro ya Muslimanan, paşve mayîna wa ye ji nezer fikrî û ferhengî û 'ilmî û teknolojîyê ve. Û çareya wê ew e ku pê çêkirin û danîna merkezên 'ilmî û zanîngeh û medresan jin û zelamên Muslimana bên agah kirin û ji nezer fikr û ferheng û zanînê ve bilind bibin û zanînên nû bikevin destê wan ji bona ku pirsgirêk û muşkilên xwe yê iqtsadî/aborî û ava kirin û sen'et ji halê rakin, û gereke xwebawerî di canê wan da were çandin ku wan dehf bidê ji meydanên 'emel û kiriyarê ra, û da şewqa wan çêbê ku xwe li ser

'alîman bi reka girtina nukmen şer'e ve ye ji wan, ku dibêjinê «teqlîd». Ew ji bona rakirina muşkilên xwe yên şer'î û fiqhî diçin bal wan û di hemî wan meselan da ku di jiyana wan da ji wan ra pêş tê, gohê xwe didin ‘alimên xwe; çiko li ser fikra wan ew ‘alim wekîlên imamê axir zeman in û bi awayek giştî ji wî ra nûner in.

Û ji ber ku ‘alimên wan ji bona jiyana xwe û ihtiyacî ya xwe ya malî bi dewlet û hukumetan ve ne girêdayî ne û ewa ji xwe re nakin palgeh, evî koma mezin baweriyek zehf zêde bi wan hene.

Û hewze (merkez) yên 'ilmê dînî ku ‘alim li wêderê digehin û radibin, ji alîyê wan ve tên idare kirin, bi vî awayî ku xelk xums û zekata xwe bi viyan û bi dilê xwe didin wan ‘alimên

neq nene ku ji hukmeten Îslame benremend bibin ku bi Qur'an û sunnetê 'emel bikin; hukumetekî ku heq huqûqê Muslimana biparêzê û irtbat û peywendek durust û bi selamet digel dewletên dî girêdê, û hay ji hudûd û sînorên wê bimînê û serxwebûna ferhengî û iqtsadî û siyasî ya Muslimana ragirê da ku Musilman 'ezîz û qewî bin wek çewa Xwedê ji wan ra ewê dixwazê, li wêderê ku kerem dikê:

"Izzet û serbilndî, ya Xwedê û Pêxemberê Wî û bawerdara ye". [31]

Û kerem kir: **"Ne sist bin û ne xemdar, û hûn in yên bilindtir eger hûn bawerdar bin".** [32]

Û Şî'e wereng difikirin ku dînê Îslamê -çewa ku kamil û temam e- hemî hukmên ku ji jiyanê ra lazim in têda hene, xweyê rê û resmekî ye ji

derênê û dûmahîyê bidê evan muşkil û nexweşîyên bê hed û hesab. Wellah-un Nasir-u we-l Mu'în.

Eger hûn arî dînê Xwedê bikin wê Xwedê arî we bikê û gavên we qayîm û cîgirtî bikê.

Evênhe berçavtirîn mesele ne li bal Şî'ên Imamî ku ji wan ra Ce'ferî jî tê gotin.

Ev birra he, îro li kêleka birayên xwe yên Musilman da li hemî welatên Îslamî da dijîn û gelek muhimmatê dixwin ji parastina Muslimana û 'ezîz mayîna wan ra û hazir in ku can û hemî tiştên xwe yên giranbiha di vê rêkê da bidin.

We-l Hemd-û Lîllah-î Rebbî-îl 'Alemîn